Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de


Hejmar: 44
31'ê July 2006
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Konferansa Çapemeniyê ya Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Birêz Mistefa Hicrî, derheq sefera xwe ya çend mehan bo derveyî welat



Roja pêncşem, 27.07.2006'an, Konferanseke Çapemeniyê ji bo rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê derheq pirsên têkildar yên kar, xebat û çalakiyên sefera wî ya çend mehî bo derveyî welat hate lidarxistin. Deqa Konferansê di hejmara tê ya Agirî û her wiha bi zûyî li ser malpera me tê weşandin...

# Îranê ferman da, Hizbulahê dest pê kir



**Ji dema ku şerê Îsraîl û Hizbulahê li Lubnanê dest pê bûye, herêma Rojhilata Navîn rastî qonxeke nû bûye. Ev şere çima û çawa derket holê? Sedemên vî şerê giran ku herêma Rojhilata Navîn berbirûyê aloziyeke giran kiriye, çi ne? Armancên Komara Îslamî ya Îranê ji bo destpêkirina vî şerî ji aliyê Hizulahê çi ne û gelek pirsên din di hevpyevîneke taybet bi rêzdar Elî Mêhrperwer, endamê Deftera Siyasî a PDK Îranê re...**

Rûpel 4




**Derheq Dosya Terora Li Dijî Dr. Qasimlo, Hevpeyvînek bi Dr. Mîro Elyar, Cihgirê Komîteya Navendî Ya PDK Îranê re**

## "Ez xistine rojeva perwendeya terorkirina Dr. Qasimlo bi ne mumkin nizanim, lê vê şans û egerê jî di pêşerojeke nêzîk de nabînim"

Rûpel 3

**Cinayeta nû ya Komara Îslamî Di girtîxaneya Êwînê de**

## Ekber Mihemedî piştî 9 rojan gireva birçîbûnê, jiyana xwe ji dest da



Ekber Mihemedî yek ji xwendekarên çeleng û azadîxwaz yê Îranê, şeva yekşem, 29.07.2006'an piştî neh rojan gireva birçîbûnê di girtîxaneya Êwînê dilê wî sekinî û jiyana xwe ji dest da. Parêzerê navhatî mirina wî gumanbar û cihê şikê da îlan kirin. Ekber Mihemedî ji sala 1999'an, dema ku xwendekaran li zanîngeha Tehranê serhildan kirin, ew wekî yek ji serok û rêveberên vê serhildana azadîxwazne hate girtin. Di van çend salên borî de navhatî di girtîxaneya hikûmeta hov ya Îslamî a Îranê ketibû ber hemû cure lêdan, îşkenceyên cendekî û ruhî û ... lewra jî stûna pişta wî derbeyên giran dîtibûn û dilê wî jî rastî pirsgirêkên xurt bibû. Nojdaran diyar kiribû ku navhatî ji ber xurtbûna pirsgirêkên tenduristiyê nabe di girtîxaneyê de bimîne. Li gorî agahiyê nûçeyan, Ekber Mihemedî roja berî mirinê, dikeve ber lêdan û îşkenceyê û ew dest û pê girêdayî û her wiha devê wî çesp lêdayî hatibû dîtin.

## Konseya Ewlekariya NY biryarnameyek derheq xebatên Etomî yên Îranê pejirand



Konseya Ewlekariya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî roja duşem, 30.07.2006'an, biryarnameyek pesend kir û tê de ji Îranê xwest ku xebatên xwe yên Etomî heya 31' "August"ê bide helawîstin. Divê biryarnameyê de hatiye: Heke Îran helawîstina Uraniyûmê ne pejirîne, dê rastî dorpêçkirinên aborî bibe. 14 welatan ev biryarnemaye pesend kirin. Tenê welatê Qeterê dengê NA da biryarnameyê. Heke Îran detanî dema diyarîkirî, xebatên Etomî yên xwe ne helawîse, dê berbirûyê cezayan bibe.

Cewad Zerîf, nûnerê Komara Îslamî a Îranê di RNY de, ew biryarnameya Konseya Ewlekariyê ret kir!

**Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq Liv Û Tevgera Nerazîbûnê Ya Xelkê Kurdistanê Di 17'emîn Salvegera Terorkirina Dr. Qasimlo De**

Rûpel 2

**Peyama Serxweşiya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bi Boneya Koça Dawî Ya Xatûna Sureya Siracedînî**




Rûpel 2

**Şano û Pirsa Jinan**



Rûpel 9

**RONAKBÎRÎ**



Rûpel 10

www.arsivakurd.org

# Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq Liv Û Tevgera Nerazîbûnê Ya Xelkê Kurdistanê Di 17'emîn Salvegera Teror kirina Dr. Qasimlo De

**Civatên xelkê Kurdistanê!**
**Endam û alîgirên PDK Îranê!**

Di 22'ê Pûşpera îsal, hevdehemîn salvegera teror li dijî Dr. Qasimloyê nemir, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û kesayetiyê navdar û mezin yê Kurd de, civatên gelê Kurd li seranserê Kurdistanê ji bo bi dengevehatina bangewaz û gaziya PDK Îranê bi armanca şermezarkirina dubare ya Komara Îslamî a Îranê û rêberên vê rejîmê wekî destûrder û gelalerêjên vê terorê û nîşandana nifret û nerazîbûnê ji rejîmê, careke din panoramayeke berfireh ya dîke di hatne meydan û helwestgirtinê de xistin rojevê.

Xelkê Kurdistanê di vê rojê de bi daxistina dukan û bazaran û dest ji kar berdanê û di şeva 22 li ser 23'yê jî bi temirandina elektirîka malan, ew jî bi awayekî wiha giştî, careke din sozdariya xwe ji bo rêbaza Dr. Qasimloyê nemir û canê paqij yê wî rêberê mezin û partiya Dr. Qasimlo dubare kirin û xuya kirin ku rêvîngê nerawestiyayî, çavnetirs û mandînenas yê rêya gihîştin bi armancên Dr. Qasimlo û tev şehîdan û PDK Îranê ne.

Ev tevger û hereketa nerazîbûnê ya berfireh û berbiçav di halekê de hate encam dan ku rejîma Komara Îslamî û hêzên wê yên serkutker hemû amadekariyek ji bo berbirûbûn tevî her liv û tevgereke bi vî awayî û tepeserkirin û perçiqandina xelkê di vê rojê de berçav girtibûn. Lê derket, li hemberî vîn û îradeya gel û hevgirtina xelkê Kurdistanê de tu kosp û astengek nikare rêgir û berxweder be.

Deftera Siyasî ya PDK Îranê, bi hinceta vê liv û tevgera fereh û berçav ku encama vîna qahîm û hevdengiya xelkê Kurdistanê bû, emegdarî û pêzanîna xwe dide xuya kirin û sipasa ew xelkê xebatkar, çavnetirs û berxweder dike ku bi vî awayî bi pêşwaziya bangewaza PDK Îranê, partiya Qasimlo û partiya rêber ya xebata xelkê Kurdistanê ve hatin. Destê kit kite gişt wan kesan digivişîne ku karê rêxistin û biencam gihandina vê liv û tevgerê çi li hundirê Kurdistanê û çi li derveyî welat jî di şekl û awayên din de li stû hebûn.

Sipas ji hemûyan re û serkevtin ji bo bizava gelê Kurd li Kurdistana Îranê bi rêberiya PDK Îranê

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**16.07.2006**
**25.04.1385**

# Peyama Serxweşiya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bi Boneya Koça Dawî Ya Xatûna Sureya Siracedînî

**Endamên birêz yên birêveberiya Kongreya Neteweyî ya Kurd li Amerîkaya Bakûr**
**Silav**

Tevî kul û kesereke giran, me xeberê mirina bêwext û li nişkêve ya xatûna Sureya Siracedînî, Cîgira Serokê Kongreya Neteweyî ya Kurd "KNC"yê û xebatkara rêya demokrasiyê û çeleng di warê wekheviya mafê jinan û mêran di civakê de û dosteke nêzîk yê PDK Îranê bihîst û em gelek xembar û nereht kirin.

Bi vê hincetê ve, em tevî derbirîna xem û kesera xwe bona ji destçûna wê xanima çeleng û dilsoj, serxweşî û sersaxiyê ji we rêzdaran û tev dost, nasyar û bi taybet hevjîn û malbata wê ya birêz dikin û em xwe di vê xem û kula mezin de şirîk û hevbeş dizanin. Em sebr û sersaxiyê bo hemû aliyekê bi hêvî dixwazin.



**Deftera Siyasî ya PDK Îranê**
**26.07.2006**
**04.05.1385**

# Daxuyaniya Xwendekarên Serbixwe Ên Zanîngeha Azad Ya Sine

Terorkirina yek ji siyasetvanên herî berçav yê Kurd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo bi destê rejîma terorîstperwer ya Komara Îsalmî a Îranê nîşana ne pêbendbûna vê rejîmê bi mafên xwezayî yên mirovan û bingehên mirovî ye û dijî madeyên 3, 5, 18 û 19'an ya Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan e.

Em xwendekar û çelengên siyasî yên serbixwe ên Zanîngeha Azad ya Sine wekî endamek ji civaka alîgirê raderbirînê û mafên mirovan û dijberê tundî û dijwarî di Îranê de, terora li dijî rêberê berê yê PDK Îranê, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û du hevalên wî dijî pîvanên cîhanî ên mafên mirovan dizanin û vê terora hov û dirindane bi destê kirêgirtiyên Komara Îslamî a Îranê mehkûm û şermezar dikin û ji tev rêxistinên parêzer ên mafên mirovan daxwaza girtin û dadgehîkirina rêveberên vê terora dirindane ku li serveyî hemûyan Serkomarê Îranê, Mehmûd Ehmedînejad cih girtiye, di dadgeheke navneteweyî de ne.

**Îmza**
**Komek ji xwendekar û çalakên siyasî yên Zanîngeha Azad ya Sine**
**22.04.1385'ê Rojî**
**13.07.2006'ê Zayînî**

# Derheq Dosya Terora Li Dijî Dr. Qasimlo, Hevpeyvînek bi Dr. Mîro Elyar, Cihgirê Komîteya Navendî A PDK Îranê Re

**Hevpeyvîn: B. Hîwa**



Dr. Mîro Elyar

**Dewleta Otrîşê di navbera du rîswayiyan de!!.**

*17 sal bi ser bûyera terora li dijî Dr. Qasimlo, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û hevalên wî: Ebdula Qadirîazer û Dr. Fazil Resûl re derbas dibe.*

*Serbarê daxwazên malbatên goriyan û rexne û lomeyên Partiya Demokrat û sazî û kesayetiyên demokrat û mirovhez, lê ji aliyê dewleta Otrîşê ve, dosya vê terorê her wiha daxistî maye.*

*Ji bo tîrojkxistin li ser rewşa vê dosyayê û sedemên helwesta bêşermane a dewleta vî welatî her ji destpêka bûyerê heya niha, me ev hevpeyvîne tevî Dr. Mîro Elyar, endamê Cihgirê Komîteya Navendî a PDK Îranê ku li Otrîşê dijî, pêk aniye. Li gor bersîva Dr. Elyar, dewleta Otrîşê bona wê çendê ku Rejîma Îranê perde li ser "Riswayiya Norîkom"ê hil neda, riswayiya hinartina bikujên Dr. Qasimlo ji bo Tehranê û ragirtina dosyeya vê terorê ji bo xwe hilbijart.*

**Gelo tiştek bi navê dosya terora li dijî Dr. Qasimlo yan bûyera 13'ê Jûiyê li dezgeha dadê an jî Polîsê Otrîşê de heye?**

Belê, perwendeya Dr. Qasimlo û hevalên wî her piştî bûyerê û diyarîkirina Parêzer ji aliyê malbatên şehîdan ve pêk hat û niha jî ne hatiye daxistin, belkî hatiye ragirtin.



Şehîd Ebdula Qadirîazer Şehîd Dr. Qasimlo

**Sedemên ragirtina vê dosyayê çi ne? Karbidest û rayedarên Otrîşê basa çi sedemekê dikin û raya te bi xwe di vê derheqê de çiye?**

Rayedarên Otrîşê dibêjin ku wan heya niha tu belge û giroveyeke nû û di warê hiqûqî de qahîm û cihê selimandinê bi dest nexistine ku ji bo vekirina dosyayê baş bibin. Bi raya min ev gotina bi vî awayî ne rast e, li dîroka terorên siyasî û nemaze zaf kuştinên dîke de jî carr bûye û car e ku zaniyarî tên cudakirin, yanî ew zanyariyên ku bi parêzer û malbatên kujer û bikuj û her wiha bi xelkê tên ragihandin (giştî), ew zanyariyên ku Polîs û dezgeha Dadê bal xwe radigirin (taybetî) û raya giştî jê agehdar nabe.

Lewra ger em tenê zanyariyên giştî bikin pîvan, rayedarên Otrîşê belge û giroveyên ne înkarker (haşa helnegir) ên gunehbarbûna Komara Îslamî ji dest xwe dan, yan veşartin, yan jî pişt guh xistin.

Di gava yekem de wan bikuj ku di destê Polîs de bûn, bêy wê ku radestî dadgehê bikin, bi awayê herî tirsinokane di Otrîşê de derxistin û şandin Tehranê. Eva jî di çaxekê de ye ku gotinên **Mihemed Cefer Sehrarûdî** û **Emîr Mensûr Buzirgiyan** li dema lêpirsîna Polîs de dijî hev bûne û heta hevdu bi derew dayne zanîn. Her ji ber vê yekê jî diviya aliyê kêm wekî gumanbar dadgeh ji wan re pêk anîban.

Heta ji birîndarbûna Sehrarûdî ku ji aliyê hevalên xwe ve bi şaşî hatibû birîndar kirin, lêpirsîn nekirin, ji wê henektir, rejîma Îranê jî nepirsî ku dîplomatê wan çima û çawa birîndar bûye! Ji bilî vê jî di hikmê dadgeha Berlînê de (li heyamê terorkirina Dr. Seîd û hevalên wî), desthilatdarên Komara Îslamî bi darêjer û birêveberên terora li dijî Dr. Qasimlo û hevalên wî jî tên nasandin. Wî hikmî hemû şik û gumanek li ser tawanbarbûna Komara Îslamî di terora Viyenê de verevand û piştî ew hikmî jî biheq bû ku dezgeha dadê a Otrîşê jî dest bi lêkolînan bike. Bi vî awayî em dibînin ku sedem û bersîvên karbidestên Otrîşê tenê hêcet û mihane ne.

**Gelo çi cehd û têkoşînek ji bo xistine rojeva dosyê hatine kirin? Van xebat û cehdane tu encamek hebûye?**

Belê, tekoşîn hatiye kirin. Di hemû salvegerekê de daxwaza xistine rojeva dosyaya terorê hatiye kirin û heta birêz **Nesrîn Qasimlo** sala 1990'an li dijî dewleta Otrîşê doz vekir, lê dadgehên Otrîşê ev doze ret kirin. Cehd û tekoşîn aliyê kêm bi qasê ku eşkere ne, encamek tune bûye.

Diyare divêt ez bibêjim, dema ku nûçegihanekî Îranî di meha Maya 2005'an de ji Îranê ve bo derve reviya, hin zanyariyên balkêş li ser terora Viyenê dane Polîsê Otrîşê û bi şahidê **D** naskirî bû. Dezgehên dadê û polîsê Otrîşê amade bûn ku nûnerê xwe ji bo lêpirsîn û vekolînê bo aliyê şahidê **D** bişînine Parîsê. Lê Wezareta Hundir a Parîsê serbarê razîbûna demkî, lê piştre razî nebûn ku nûnerên Austuryayê ji bo vekolîn û hevdîtina bi jornalîstê Îranî re biçin Firansayê.

**Parêzerê vê dosyayê, Dr. Manfirêd Waydînger 3 salan berî niha bi awayekî bi şik û guman hate kuştin. Heya niha polîs û dezgehên pêwendîdar di vê derheqê de tu zanyariyek ne ragehandine? Gelo gumana vê heye ku ev kuştine pêwendî bi dosya terorê ve hebe?**

Polîsê Otrîşê heya niha tu tiştek wiha li ser çawaniya mirina parêzer Waydînger ne ragehandiye, bi qasê ku ez agehdar im, rengê vê hindê nade ku mirina Dr. Waydînger têkilî bi dosya terora 13'ê Juiyeya 1989'an ve hebe.

**Niha piştî bihorîna 17 salan bi ser terora li dijî Dr. Qasimlo re, piştî gelek guhartinên siyasî di**

www.avakurd.org

**asta cîhanê û Austuryayê de, hûn şans û egera xistne rojeva perwendeya terora li dijî Dr. Qasimlo çawa dibînin?**

Komara Îslamî weke rejîmeke dîktator, bi binpêkerê mafê mirovan û piştevanê terorîzmê hatiye naskirin û tevî vê ku guhartinên berbiçav di nêrîn û helwesta cîhana derve de, bi taybet Ewropa li hemberî Komara Îslamî de pêk hatine û bê perde û eşkere qala teror û kiryarên din yên nebaş yên rejîmê tên kirin. Bi vî awayî tevî wê ku ez xistine rojeva perwendeya terorkirina Dr. Qasimlo bi ne mumkin nizanim, lê vê şans û egerê jî di pêşerojeke nêzîk de nabînim. Min ji ber çend sedeman jêve nine ku Austuryayê biwêrî û fidakariya hewce ji bo avêtina vê gavê hebe:

Piştî terorê, rejîma Îranê bi teybet bi du gefan dewleta Austuryayê xiste bin zext û givaşan û neçar kir ku dest ji pêkanîna dedgehê ji bo bikujan berde û wan bo Tehranê bişîne. 1: Dewleta vê demê ya Otrîşê di şerê Îran û Îraqê de berevajî yasayên wê dewletê çek û teqemenî ji Îraqê re firotibûn ku Îranê jî pê zanî û gef ji dewleta Otrîşê kir ku ger van çekane bi Îranê jî nefiroşin, Îran dê eşkere bike û herwiha pêwendiyên bazirganî yên xwe tevî Otrîşê jî qet bike. Dewleta Otrîşê jî serê xwe li hember wan gefane de çemand û bi awayê ne yasayî çek bi Komara Îslamî jî firot! Di vê alvêr û ticaretê de pareyeke yekcar zaf bezir bû. Çunku vê demê her du partiyên mezin yên Austuryayê (Partiya Sosyal Demokrat û Partiya Demokrat Mesîhî) dewleta hevbeş pêk anîbûn, di vê alvêrê de dest hebûn.


Ev pirs û meseleye di Otrîşê de bi “riswayiya Norîkom”ê bi nav û deng e, vêca rejîmê piştî terora li dijî Dr. Qasimlo bi gefa eşkerekirin û perde hildan li ser vê riswayiyê dewleta Austuryayê xist bin zext û givaşê. 2. Komara Îslamî gefa vê kir ku heke bikuj ji bo Tehranê nehên şandin, renge canê van Otrîşiyên ku di Îranê de dijîn, bikeve ber tirs û êrîşê.

Lewra renge niha Komara Îslamî nekare canê van Otrîşiyan bêxe ber metirsiyê, lê niha jî dikare bi eşkerekirina zanyariyên hûr ên “riswabûna norîkomê” girift û astengan ji bo her du partiyên navhatî biafirîne. Her eva ye ku her du partî jî alîgirê xistine rojeva dosyaya terorê nakin. Ji bilî vê jî, Austuryayê têkiliyên bazirganî yên baş û xurt bi Komara Îslamî re hene û nemaze bi bêdengî çek û teqemeniyan jî pê difiroşe! Sala borî eşkere bû ku Otrîşê razîbûna xwe li ser firotina 2000 Miselselên HS50 bo Îranê ji bo xebat dijî qaçax û bazerganiya madeyên bêhisker daye

# Rojhilata Navîn Di Nava Agirê Şereke Din De

### Hevpeyvîn bi birêz Elî Mêhrperwer, endamê Deftera Siyasî a PDK Îranê

**Hevpeyvîn: Elî Budaxî**



**Şerê nû yê “Îsraîl û Hizbulahê” di Lubnanê de bi kuştina çend Leşker û revandina 2 serbazên din yên Îsraîlê dest pê kir. Li rastî de girtina van 2 leşkerane sebeba bingehîn a destpêkirina vî şerî bû? yan sedemên din jî hene?**

Berî hemû tiştekê divêt em bibêjin ku di vê qonaxê de teysînerê vî şerî Hizbulah bû, lê çima Hizbulahê ev şere teyîsand, em dikarin qala çend sedeman bikin:

1. Rêxistina Hemasê çend rojan berî vê bûyerê leşkereke Îsraîlê revandibû, Îsraîlê jî him ji bo tolhildan û him jî ji bo azadkirina serbazê xwe êrîşên berfireh bo ser Xezê dest pê kir. Di Xezê de şereke tund ku kawil û wêranî, kuştin û birîndarên zaf jê ket, di rojevê de bû ku niha jî dom dike û ev meseleye nehatiye çareserkirin. Hizbulahê xwestiye bi vê gava xwe eniyeke din veke ku giraniya vî şerî li ser Xezê kin bike ku eva dikare weke sedemekê bihê dîtin, her çend ku ne sedema bingehîn e jî.
2. Midehek e zext û givaş li ser Hizbulahê hene ku çekên xwe danên û weke partiyeke siyasî xebata xwe di Lubnanê de bimeşîne. Destpêkirina vî şerî vê hincetê bi Hizbulahê dide ku xwe li bin givaşê rizgar bike, her çend ku ev liv û kiryare dibe sedema sorbûn û pêçeqandina pêtir a van aliyan ku xwezyarên çekdanîna Hizbulahê ne.
3. Hizbulah, alav û emraza zext û givaşa Îran û Sûriyayê di Rojhilata Navîn de bi taybet ji bo berengarbûn tevî Îsraîlê ye. Lewma em dikarin bibêjin ku biryara êrîşê bo ser Îsraîlê û revandina van du leşkerên Îsraîlê pêtir ji wê ku ji aliyê Hizbulahê ve hatibe dayîn, ji aliyê Îran û bi şêwirmendiya bi Sûriyayê re hatiye dayîn, lê çima Îran û Sûriyayê ev şere teyîsandin?

Em dikarin qala van sedeman bikin:

1. Îran ku alîkarê sereke û bingehîn yê Hizbulahê ye û di rastî de ev partiye ji aliyê Îranê ve hatiye çêkirin û Hizbulahê ji bo rojeke wiha dixwaze. Îran li vê midehê de li ser pirsa Etomî bi tundî ketiye bin givaşê û welatên 5+1 bi micid daxwaz ji Îranê kirin ku bersiva **erê** yan **na** a xwe li dor pêşniyarên wan welatan derheq programên Etomî, beriya girêdana konferansa **G8** di Rûsiyayê de bide, ku ew meseleye jî yek ji mijarên bingehîn yên welatên girûpa **G8** dibû. Afirandina kirîza şerê Lubnan û Îsraîlê yan Hizbulah û Îsraîlê, pirsa Etomî ya Îranê dixiste perawêzê û qala vê kirîzê dibû bi nûçeya sereke ya medya û ragihandinên giştî.
2. Îran bi vê kiryarê, ji Rojavayê re dide eyanê ku ger bixwaze têkderî û fitnê biafirîne, alavên vî karî di dest de hene û li rastî de jî weke alavekê mifahê jê distîne.
3. Îran dixwaze vê doz û pirsê bike bi doza **Kufr** û **Îslamê** û di Rojhilata Navîn de Îsraîlê bi sembola Kufrê bi misilmanan re bide nasîn û xwe jî weke parêzvanê xwestikên cîhana Îslamê bide nasîn. Ev kare pêtir li hundirê welat de mifah jê tê standin.
4. Ji Îranê re eyan de ku bandor û kartêkirina wan çek û teqemeniyên ku radestî Hizbulahê kirine, çiqas e û di rastî de wan çekan diceribîne.
5. Larîcanî di cehd û tekoşîna xwe ji bo qanikirina welatên 5+1 bona vê yekê ku piştî civîna girûpa G8 bersiva pêşniyarên wan bide, serneket û ji wir re rast

seredana Sûriyayê kir û piştî vê seredanê bû ku Hizbulahê êrîşa xwe ser Îsraîlê û revandina leşkerên Îsraîlê dest pê kir.

**Eva ku biryarnameya konseya Ewlekariyê di pêwendî tevî kirîza Lubnanê ji aliyê Amerîkayê ve hat weto kirin, bi vê wateyê ku divêt carê tu biryarnameyên din nehên pejirandin û em çavnihêrê kûrtirbûna vî şerî bin? Hûn encamên vî şerî çawa dibînin?**

Wetokirina biryarên konseya Ewlekariyê bi taybetî ew biryarên ku tê de Îsraîlê mehkûm û şermezar dike, ji aliyê Amerîkayê ve ne yekem car e û cara dawîn jî nabe. Amerîka piştevanê mezin yê Îsraîlê ye û meseleya han dihate çavnihêrî kirin, wiha diyar e ku pêşerojeke rohn û eşkere ji bo dawî anîn bi vî şerî di heyamek kurt de nahê xuya kirin. Îsraîlê ragihandî ye ku heta leşkerên xwe azad neke dê vî şerî bidomîne. Ceribînan jî nîşan daye ku Hizbulah bi wan zûyane êxsîrên xwe serbest nake. Ji bilî meseleya êxsîran fakterek din hatiye rojevê, wêranî û kawilbûna bajarên Lubnanê û mûşek avêtinên Hizbulahê bo bajarê "Heyfa" yê ku zêdetir ji 50 kîlometran ji sînorê Lubnanê re dûr e û kuştina çendîn kesan li wî bajarî de ji aliyekê karîn û şiyana hêza Lubnanê nîşan dide û ji aliyê din jî Îsraîlê sortir û pêdagirtir dike ku pirsa xwe bi Hizbulahê re yekcarî bike. Renge Îsraîlê amadekariya tewaw ji bo vî şerî nebe û Hizbulahê bi ser de sepandibe, lê aliyê kêm hêcetek baş ketiye destê Îsraîlê ku derba giran a xwe ji Hizbulahê bide. Heya çiqas Îsraîl di vê bernameya xwe de serkeftî dibe, yan mûşekên Hizbulahê heya çi radeyekê û çiqas ji Heyfayê derbas dibin û dûrtir tên hingavtin, her wekî Hesen Nesrula ragihandiye, pêşeroj dê nîşan bide. Bi kurtî ez dubare dikim ku di rastî de eva rikeberanê ya Îranê di gava yekem de û Sûriyayê, di gava duyemîn de tevî Îsraîlê li ser axa Lubnana perîşan û reben de ye.

**Gelo di vî şerî de Îran ew alî ye ku qazancê bike?**

Ger em wiha binirxînin ku merema Îranê kirîz afirandin be, mijûlkirina Îsraîlê li du qadên şer de be, li perawêz xistina basa pirsa Etomî ya Îranê weke pirseke rojev, nîşandana alavên zext û givaşên xwe û derbe xistin bi Îsraîlê û ne ewlehî û ne aramkirina bajarên Îsraîl û hwd ... di midehê kin de em dikarin bibêjin Îranê qazanc jê standiye, lê ger kawil kirina bajarên Lubnanê û encama şer û hêza kawilker a Îsraîlê û kûrtirbûna şer û lawazkirin yan jî ji navbirina Hizbulahê, sax kirina welatên desthilatdar û biryar bi destên cîhanê li ser vê pirsê ku li rastî de Îran makeya fitne û têkderiyê di Rojhilata Navîn de ye, xurt û qahîm kirina eniya dijî Îranê bi taybetî jar û lawazkirina pêwendiyên Rûsya û Çîn tevî Îranê û vekişiyan bo aliyê Amerîka û Ewropayê, pêdagirî û givaşên pêtir yên wan bo ser Îranê bi merema dethilgirtin ji dewlemendkirina Ûranyûmê û ... bi zirara Îranê xilas dibe û bi kurtî rengê vê hindê nadet ku domkirina şer qazanc û berjewendiya Îranê têde be.

**Egera vê heye ku peşqela agirê vî ûerî bigihîje Îran û Sûriyayê? Çunku rayedarên Îsraîlê didin zanîn ku mûşekên Hizbulahê, mûşekên "Fecra 3" ên Îranê ne?**

Agirê şer xweş bûye û mixabin rewş ş delîve ji bo xurt û berfirehtirbûna vî şerî jêhatî ye (baş e). Ez bi dûr nizanim û ger şer herwiha bidome û Îran çi bixwaze û çi nexwaze weke aliyeke vî şerî hatiye naskirin. Di rastî de Îsraîl, Hiuzbulahê bi destçêkiriyê Îranê dizane û Îranê jî aliyê hemberî xwe didanêt. Heke ev şere berbelavtir û berfirehtir be, egera tûşbûna Îran û Sûriyayê bi şer tê çavnihêrî kirin.

# YXDK Îranê Semînarek Di Bin Navê "Fêrbûn Di Mekteba Dr. Qasimlo Da" Lidarxist

Dr. Qasimlo ew rêberê mezin yê Kurd bû ku seranserê jiyana xwe ji bo xebat di rêya azadî û rizgariya mirov û parastina keramet û şerefa mirovan de terxan kir. Rêberê leheng, zana, şoreşgir, xebatkar, nûxwaz, demokrat, afirîner û bîrmendê neteweya Kurd, Dr. Qasimlo bi dîtin û hûrbûn ji êş, jan, kul û kêmasî û valahiyên civaka xwe û xebat di pêxema çareserkirin û hewildan ji bo bidestveanîna armancên rewa û pîroz ên gelê xwe, bi anîna bîr û hizreke nû weke stêrkeke geş û hertim ronîdar, çirayê rêya xebatkarên rêya azadî û serbilindiya mirov, li nava asîmanê vî welatî û hemû cîhanê de jî dê hertim ronîdar û geş be.

YXDK Îranê roja sêşem, 27.04.1385 (18.07.2006)'an, ji bo zanebûn tevî jiyan, kesayetî, bîr û hizrên wî rêberê mezin semînarek lidarxist. Di vê semînarê de xwendekarên Kurdên Îranê yên zanîngehên Hewlêr, Koyê û Silêmaniyê û her wiha hindek rêxistinên medenî yên Kurdistana Îraqê beşdar bûn û semînarê demjimêr 17'ê piştî nîvro dest bi karê xwe kir. Di destpêka semînarê de Xatûna Fatime Osmanî, endama Desteya Damezrîner a YXDK Îranê bixêrhatina mêvanan kir û piştre birêz Erfan Rehnimûn gotarek li ser navê **"Afirandin û nûxwazî di xebat û têkoşîna şehîd Dr. Qasimlo da"** pêşkêş kir.



**Dîmenek ji beşdarên semînara "Fêrbûn Di Mekteba Dr. Qasimlo Da"**

Kekê Erfan, bal kişande ser mirovê afirîner û hegerên ku mirov dikin miroveke jêhatî û karîzma û di dema gotara xwe de dîtingeha xwe ji bo afirandin û nûxwaziyê xiste ber bas û piştre li ser afirandin û nûxwaziya Dr. Qasimlo û berhemên wî di hizr û ramana niha ya xebat û tekoşîna siyasî de axivî. Paşan di hola semînarê de "Sîmayê Demokrat" bi dengê Dr. Qasimloyê nemir ji beşdaran re hate belavkirin.

Gotara duyem ji aliyê Cemîl Kulahî û di bin navê **"Dr. Qasimlo û ramana aştîxwazane û bawerî bi gotûbêjê"** di semînarê de hate pêşkêşkirin. Kekê Cemîl bi anîne berbasa pêvjoya aştîxwaziyê û bas li ser aştîxwazbûna Dr. Qasimlo û baweriya wî bi gotûbêjê pêşkêş kir.

Piştre bi pêşkêşkirina gotarek bi navê **"Dr. Qasimlo Şoreşgerek rasateqîn"** ku ji aliyê Rambud Lutfpûrî ve hate pêşkêşkirin, semînar dom kir. Li pey gotara kekê Rambud,

www.arsivakurd.org

# Bibîranîna Goriyên Çeka Kîmyayî Ya Zerde

**Rehîm Reşîdî**

Gundê Zerde, li Bakûra bajarê Serpêla Zehaw, li herêma Kirmaşanê hilketiye. Destpêka bilindahiya Çiyayê serkêş û bilind yê **Dalaho** ku herêmeke dilber û xweşik e, gundê Zerde di hembêza xwezayê xwe ya balkêş de cih kiriye.

Xelkê gundê Zerde, wekî piraniya xelkê gundên herêmên din, piranî li cotkariya bibereket ya xwemalî, pezdarî û wd behremend in. Ev xelkê zehmetkêş û mandînenas bi hêz û qaweta bask û bazikan, bi tekoşîn û keda berdewam nanê xwe bidest dixin û serbilindane jiyan û demê derbas dikin.

Di vî gundî de baxên meyweyên wekî hincîr, xox, hinar, qeysî, sêv, gûz, rezên tirî berçav dikevin. Ev berhemane hasil û encama ked, zehmet û ereqeya hewildana xelkê gundê Zerde yê ne. Di rastî da ev xwezaya rengîn, encama xebata jar û xizanên herêmê ye, di heman hal de hezkirin û hêvî û xeyala kûr ya wan bi jiyan û borandina mirovî û aştîxwazane nîşan dide.

Gora Pîroz ya **Dawûd Kevsewar**, **Baba Yadgar**, **Şah Birahîm** û çendîn kesayetî û Pêşewayên din yên agîna "Ehlê heq" yan **Yarsan** li Zerde hilketine.

Eva jî sedemeke girîng e ku rol û bandora herêmê ber bi jor hildikişîne û di encam de bibe navenda kombûna evîndarên vê rêbaza olî, bi awayekê ku salane bi hezaran kes li herêm û deverên cur bi cur têne wir û raz û niyaza ayînî ya xwe tînin holê û kul û




derdên dilê xwe dirêjin.

Ji aliyeke din ve daristan, zozan, çêrîngeh, sûlên pir haje haj, dîmen û xwezaya dilber, ev herême yê kiriye tabloyek rengîn û sebebê hatina berdewam a xelkê biyanî û xweyî ji bo dola **Baba Yadgar** û **Ban Zerde**.

Van taybetmendiyan wisan jê kiriye ku Zerde bi berdewamî hembêza xwe ji bo hatin û qerebalix û gerok û siyahetkaran veke. Bi curekê ku salane bi dehan û bigre sedan gerokên xweyî û biyanî ji bo veheviyan û bêhnvedanê, borandina demên xweş rû li wir dikin û tê de cih digirin û xem û kulên dil didin ba.

Hêjayî gotinê ye ku çavkaniya ava Qeslanê ku ji bo peyrewên ayîna Yarsan pîroz e, li Baba Yadgar serçave digre, bi dol û deviyên teng de dibore û di dilê Zerde de bend dibe. Ava ku ereqeya ser eniya rêvîngên mandî ra dike, dilê evîndaran û hogirên jiyan û xweşikiyê



**Wêneyek ji gundê Zerde**

hênik dike.

Gundê Zerde, di bervara 22.07.1988'an ya Zayînî de dikeve ber êrîşa çeka kîmyayî, di encam de 275 kas jiyana xwe ji dest didin û 1146 kasên din birîndar dibin.

Hetanî niha jî ku heyamê 18 salan bi ser vê bûyera dijî mirovî dibore, piraniya birîndarên vê bûyerê bi sedema nebûna îmkanata hewce û guhnedana rayedaran, bi destê êş û nexweşiyên cur bi cur ku encama bikarhatina çeka kîmyayî ne, dinalînin.

Encama van lêkolînên ku piştî qewmîna karesatê di vê deverê de hate kirin, vê rastiyê diselimîne ku nêzîk bi 40 ji sedê ya rêjeya liberçûn, neşînbûna pêwîst ya gul û giyayan û berhemên cotkariyê, hevdem jordeçûna asta nexweşiya tengnefesî, mêjî, penceşêr û hwd ..., encama bikaranîna çeka kîmyayî û xemsariya rayedaran û bêehdbûna wan ji asta jiyan û çarenivîsa xelkê xizan û destkurt yê vê herêmê bi başî diselimînin.

Heke 18 salan berî niha, rayedarên dewleta dîktator ya Îraqê di kiryareke nemirovane de ku dijî hemû pîvanên Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan, ev tawane afirandin û xaleke din ya nemirovane di karnameya reş a desthilata xedar û stemkar ya xwe de tomar kir, xa berpirsyar û birêveberên Komara Îslamî ya Îranê bi balnedan bi hewcehiyên wî xelkê belengaz û bêpar, bûne şirîk û hevdestê afirînerên vê cinayeta hovane. Di rastî de para herî zaf ya guneha vê karesatê ber rêveberên Mekteba "Edla Elî" dikeve.

**Wergêr: Azad Kurdî**

helbesta **"Jiyanewe"**, hûnana helbestavanê navdar yê gelê me, **Fireydun Erşedî** bi dengê xwe ji beşdaran re hate belavkirin.

Gotara "**Dr. Qasimlo mamostayê demokrasiyê"** di doma semînarê de ji aliyê Kerîm Perwîzî ve hate pêşkêş kirin. Kekê Kerîm di destpêka gotara xwe de basek ji nêrînên xwe ji bo demokrasiyê û herwiha dêtina Dr. Qasimlo ji bo demokrasiyê ji mêzgeha mirovî û parastina kerameta însanî ve kiribû û di dema basê de demokrasî di teoriyê de li gor nêrînên Dr. Qasimlo dabû şirove û dahûrandin ku di asta 1- Civak û rêvebirina welat 2- Di nava partiyê de 3- Takek demokrat de bas jî kir.

Di dawiya gotarê de birêz Perwîzî piratîzekirina demokrasiyê di xebat û çalakiyên Dr. Qasimlo de li ser her sê astên de anîn berbas.

Hûşyar Ehmedî, beşdareke din bû ku bi gotara **"Deryayek aştîxwazî û eniyek dijî terorê"**, bas ji aştîxwazî û dijberiya Dr. Qasimlo tevî terorîzmê kiribû.

Mûsa Babaxanî gotara **" Dr. Qasimlo hogirê aştiyê"** pêşkêş kir ku kesayetiya aştîxwaz ya Dr. Qasimlo bi beşdaran dinasand û bas ji wan aliyan dikir ku wê demê rexne ji aştîxwaziya Dr. Qasimlo girtin û niha bi rastiya gotinên rêberê zana gihîştine.

Saman Konepoşî kesê dawî bû ku bi gotara **"Dr. Qasimlo û bawerî bi cudahiyan"** dîtin û ramanên Dr. Qasimlo ji bo bawerî bi piratî û piloralîzmê û pêçeqandin li ser cudahiyan û pirneteweyî bûnê di Îranê de xiste berbas.

www.arsivakurdi.org

# Berfirekirina Siyaseta Dijî Jin Di Komara Îslamî De

**Enwer Esedzade**

Her tevî hatina hezareya sêyem û geşekirina ragihandinê û herwiha geşekirina bizavên civakî, bi taybet bizava jinan û cehd û hewla bê mînak a jinan ji bo bidestveanîna mafê xwe û bezandina komek kosp û astengan û herwiha hewldan ji bo xwe derbaskirin ji rêbaz û yasayên kevin û paşmayî yên civaka mêr serdest xwe bi xwe komek gavên micid û netirsane ne ku jinên piraniya welatên cîhanê di vî serdemî de avêtine.

Lê belê eva cihê nirx û baldanê eva ye ku di serdemeke bi vî awayî de rejîma dijî jin a Komara Îslamî careke din yê dest daye pesendkirina yasayeke bi tevahî dijminkarane dijî jinên Îranê hetanî ku bo hergav û bi awayekî eşkere nîşan bide ku berdewam wekî rejîmeke mêr serdest li dijî her cure azadî û serxwebûneke jinan e. Yek ji van yasayane tevgeriya na xurt tevî wan jinane ye ku lixwekirina Îslamî naparêzin, eva di halekê de ye ku bi hinceta wan guhartinên berfireh ku di asta cîhanê de derketine rojevê û jinan karîne bi hewl û mandîbûna xwe pir astengan derbas bikin. Lê belê Komara Îslamî hertim cehd dike ku bi biryarên dijî jin astengan ji bo jinan çê bike û zext û givaşên ser jinan zêde bike û hizra rizgarîxwazane ya wan ji nav bibe.

Rejîma Komara Îslamî di heyamê desthilatdariya xwe de hertim cehd kiriye hebûna jinan weke nîva civakê bi terzên cur bi cur nedîtî bigre û li rex vê de jî bi hêceta ne birêvebirina yasayên Îslamê pêşî li serxwebûn û geşekirina karîn û şiyanên jinan bigre. Tevî hatine ser şola "**Welayeta Feqîh**", komek biryar û yasa bi ser jinan hatin sepandin û li bin biryara karbidestên sereve yên Îranê dar û destekên Besîcî û Hizbulahî di destpêka şoreşa gelên Îranê de hetanî niha bi sepandina




**Keç jinên ku liberkirina wan ne bi dilê Komara Îslamî be, tên girtin, êşandin û dikevin ber lê pirsînê**

lixwekirinê li ser jinan û her wiha girtin û lêdan û pêkanîna rewşeke tejî tirs û xof bi ser wan bûne sedema vê yekê ku jin di kuncên mala xwe de heps bibin û pêşî ji geşekirin û şiyana wan bihê girtin. Evane û xebat ji bo kultursaziya komek siyasetên dijî mirovî yên din ji binemayên fikrî yên bingehîn ên rejîma taze bi desthilat gihîştî di Îranê de bû ji bo nehêlana bîr û hizra serxwebûna jinan berçav girtibû.

Girtina biryarên dijî jin yên bi vî awayî ji aliyê karbidesteke bilind yê rejîmê di vê demê de ku rejîm tûşî kirîzeke berfireh bûye û rojane bi terzeke berdewam ji aliyê raya giştî weke welateke pêpeskerê mafên mirovan û girtin û îşkencekirina rojnamevan û cudabîran û herwiha pêpeskerê mafên jinan hatiye nasîn, xwe bi xwe nîşaneya tirsa rejîmê ji hatine holê ya bizava bihêz ya jinan e ku bi awayekê micid ber bi geşebûnê diçe û ber bi aliyê demokratîkbûnê gavan hildigire û eva bûye sedema vê yekê ku rejîm bi terzekê hewil bide ji bo çêkirina astengên li ser rêya wan.

Eva cihê keyfxweşiyê ye ku jinên Îranê bi ji berçavgirtina siyasetên wiha ji aliyê rayedarên Komara Îslamî, dest ji xebatê ber nadin û zêdetir kakil û naveroka rastîn ya Komara Îslamî ji bo cîhanê didin eyan kirin.

Jinên Îranê divêt di vî serdemî de bi yekbûn û giştgirî ji hev, tevî hêzên pêşketinxwaz ên din yên Îranê cehdê bikin bi siyaseteke aqilane bi dijî hizr û siyasetên dijî jin û nemirovane yên rejîma Komara Îslamî gavan hilgirin.

**Werger: Meryem Hacîpûr**
**Têdîtin: Ev nivîsare ji malpera "rassaa"yê hatiye wergirtin.**

## Îşkencekirina Hov Ya 2 Girtiyên Hepsa Merîwanê

Eva du hefte ye ku "Hefazet" (parastina) girtîxaneya Merîwanê zext û îşkence xistiye ser du girtiyan bi navên Rehman Heyderî û Celîl Ehmedî. Navhatiyên han 18 mehan berî niha seba hiloşandina peykerê Husên Fehmîde, hatin dest bi ser kirin ku Rehman bi 7 sal û Celîl jî bi 2 salan zîndanê mehkûm bûn.

Li midehê 2 hefteyên çûyî de her du girtiyên han ji aliyê Şehab Pûrmihemed, berpirs, Eşref Îbrahîmî, cîgir, Newrozî û Melekî, li "Hefazet"(parastin)a zîndana Merîwanê, bi awayekî hov û nemirovane, dest û pêyên wan tên gitêdan û îşkenceya cendekî û derûnî hatine kirin.

Hêjayî gotinê ye ku ev leşker û memûrên ku ne amade bûne ji bo îşkencekirina du kesên navhatî, ji aliyê berpirsên navhatî hatine ceza dan, ji miaşê memûran jî heqê mehekê hatiye kêm kirin û ji leşkeran re jî mehek xizmeta zêde hatiye dayîn.

## Hêzên Rejîmê Li Mehabadê Ciwanan Dixapînin Û Destdirêjiyê Li Ser Wan Dikin

Xizir Elîpûr û Hesen Bayzîdî, du kirêgirtî û caşên dezgeha ewlekariya rejîmê ya Mehabadê ne ku midehek e ketine nava bajar û ciwanan dixapînin, siwarê otombêlan dikin, dibin derveyî bajar û piştre destdirêjiyê li ser wan dikin û madeyên bêhişker li cendekê wan didin ku hetanî niha du ciwanên ku temenê wan kêmtir ji 15 saliyê ye, bi hegera han canê xwe ji dest dane.


Her wiha meha çûyî ji îdareya Ewlekariya Mehabdê di kiryareke dijî gelî ya din de û bi merema nexweşkirina ciwanan bi nexweşiya îdzê, nêzîkî 20 jinên Tehranî yên ku nexweşiya han girtine, berdayîne nava bajarê Mehabadê.



www.arsivakurd.org

# Di Rojê De 6 Hezar Ciwan Di Cîhanê De Tûşî Nexweşiya "HIV"yê Dibin

Midûra birêveber ya Sindoqa Nifûsê ya Neteweyên Yekbûyî di peyamekê bi hinceta 20'ê Pûşperê, Roja Cîhanî ya Ciwanan da xuya kirin ku rojane 6 hezar ciwan di cîhanê de rastî nexweşiya "HIV"yê (Îdzê) dibin. Eva di halekê de ye ku zêdetir ji 500 milyon ciwanên temen 15 heta 24 salî bi pereyê kêmtir ji 2 Dolaran di rojê de dijîn û 96 milyon jinên ciwan di welatên di halê geşekirine de nikarin bixwînin û binivîsin û di salê de jî 14 milyon keçên temen 15 hetanî 19 salî dibin bi dayîk.
Xatûna Sureya Ehmed Ebîd, di peyama xwe de dibêje:



"Îro bi milyonan ciwan tevî xizanî û jariyê, nexwendewarî, xetereyên pêgiranî (avisbûnê) û Vîrûsa "HIV"yê û ... berbirû ne."

# Rapora Rêxistina Neteweyên Yekbûyî Li Ser Nifûsa Cîhanê




Zêdebûna xurt ya nifûsa mêran di welatên di halê geşekirinê de, dê bibe sedema vê yekê ku di salên pêşîn de pirsgirêkên perwerdeyî û saxlemiyê di van welatan de li gor welatên senetî yên cîhanê pêvajoyeke bilez diyar dike. Tê pêşdîtin kirin ku nifûsa Afrîqayê hetanî nîviya sedsala pêşîn, yek milyar kes zêde dibe û nifûsa Hindistan û Çînê jî ji 3 milyar kesan dê zêdetir bibe.
Nifûsa dinyayê 6/5 milyar e. Di her çirkeyekê 2 kes û nîv bi nifûsa cîhanê zêde dibe û di her demjmêrê de 150 kes zêde dibe.

**Jêder: "akhbare rooz"**

# Di Her Nîv Demjmêrekê De Jinek Li Efxanistanê Dibe Goriyê Tûnd Û Tûjiyê

Sureya Sebrayn, karnas û parêzera mafê jinan di Efxanistanê da xuya kir ku di her demjimêrekê de jinek dibe goriyê tund û tûjiyê. Herwiha mînaka herî berçav kuştina "Nadî Encûmen" helbestvana bi nav û deng a Heratê ye ku goriyê tund û tûjiyên malbatî bû.
Komîsyona Mafê Mirovan Li Efxanistanê, bi belavkirina daxuyaniyekê da zanîn ku di 9 mehên borî de, 1337 nimûne binpêkirina mafê jinan di wî welatî de hatiye tomarkirin.
101 nimûne xweşewitandin, 38 nimûne kuştin, 199 nimûne tund û tûjiya cendekî, 266 nimûne liberbirina zarokan bi neçarî, 76 nimûne zewaca bineçarî , 71



nimûne nedana nefeqê, 15 nimûne xwekuştin, 11 nimûne pêşgîrî ji xebata civakî, 21 nimûne tecawiza zayendî, 462 nimûne mifah wergirtina mecbûrî ji madeyên bêhişker ji nimûneyên din yên binpêkirina mafên jinan di Efxanistanê de ye.
**Jêder: malpera "gooya news"**

# Dîsan Xwekuştina Jineke Kurd

Çend roj berî niha keçek bi navê **Mêhnaz Ehmedzade** keça Mistefa xelkê gundê "Koktepe"ya Mehabadê bi sedema pirsgirêk û arîşeyên malbatî di kûrexaneya Merendê de agir berda xwe.
Navhatî li demekê ku poşman bibû û cehd dikir ji bo ku agirê laşê xwe bitemirîne, nêzîk sîmê elekterîkê dibe û bi vê sedemê jiyana xwe ji dest dide.

## 44 Ji Sedê Ya Sedema Mirina Dayîkan Li Afrîqayê Liberbirina Bê Tendrustiya Baş E

Saziya navneteweyî ya tenduristiya kar û barên zayendî û çêkirina zarokan (IPASD) da xuya kirin ku 44 ji sedê ya sedema mirina dayîkên cîhanê liberbirina zarokan bi awayê ne saxlemî û nedirust di welatên Afrîqayî de ye.
Berpirsê saziya "IPASD"ê di welatê Nîcîryayê da eyan kir ku di salê de zêdetir ji 4 milyon liberbirinên zarokan bi awayê ne saxlem di Afrîqayê çê dibe ku 140 hezar nimûne dibin sedema razandina jinan di nexweşxaneyan de.

**Jêder: malpera "irwomen"**

## Li Mehabadê 2 Kasibkar Bi Destê Hêzên Rejîmê Birîndar Bûn

Hêzên rejîmê êvariya roja yekşem 08.05.1385(30.07.2006)'an, li baxê Mikaîlî ya Mehabadê teqe li otombêleke cure Lankrozêr kirin ku bû hegera vegeriyana otombêlê û birîndarbûna du welatiyan bi navên Şehram Silêmanî û Mehmûd, nişteciyên bajarê navhatî.
Piştî vê bûyerê ciwanên bajar ji bo derbirîna nerazîbûna xwe û rizgar kirina birîndaran li dest hêzên rejîmê êrîş kirin ser hêzên han ku pevçûn di navbera her du aliyan de çêbû, lê hêzên rejîmê bi zûyî birîndar li cihê qewimîna bûyerê dûr xistin.

## Li Herêma Banê Bi Sedema Teqîna Mayînê Kuştî Û Birîndar Çê bûn

Roja 04.05.1385(26.07.2006)'an, li çiyayê Kelecar li gundê Hewtaşî, ya ser bi herêma Bane, bi sedema teqîna mayînê di bin tiraxtorekê de dema ku diçû ser coxînê, ciwanek bi navê Omîd Ebdî, kurê Husên, xelkê gundê navhatî canê xwe ji dest da û ajotkarê tiraxtorê jî birîndar bû.



# Şano û Pirsa Jinan

**Dara Natiq**

Jin nîva civakê ye û mil bi milê mêran di qada şanoya jiyanê de xebatê dike. Şanoya hunerî jî şanoyeke biçûk ya jiyana mirovan e, ew hunera ku di çarçoveya Şanoyê de tê nimayîş kirin, wêneyeke biçûk ji jiyana civakê ye, ev civaka ku pêk hatiye ji jin û mêran.
Ku wisan bû her weke jin çawa di jiyanê de herdem tevî mêran zehmetê dikişîne, diviya wisan jî li ser textê Şanoyê rola xwe a jinanî bilîze û hebûna xwe bide selimandin.
Divêt her di destpêkê de ji aliyê Şanonivîsan ve giringiya hewce bi doza jinan bihê dan û rola jinan mil bi milê rola mêran di berhemên Şanoyî de bihê xuyakirin.
Hevdem tevî serhildana civaka pirqatî de cudahî kete navbera jin û mêr û çewisandin û perçiqandina jinan ji aliyê civakê û mêran ve dest pê kir....
Her li demên berê ve heya niha nivîskar û hunermendên hişyar û pêşkevtinxwaz bi bîr û baweriyeke mirovane û berhemên xwedîhêz û bibandor hatine meydana berevanî kirin ji mafê jinan û dirûşma wekheviya navbera jin û mêran bilind kirin û bi dijî çewisandin û tepeseriya jinan rawestane.
Şanonivîs û derhênerên bîrronak û xwedî helwestên pêşkevtinxwaz yên warê Şanoyê, di serdemên cur bi cur de, ji rêya nivîsîn û nimayîşkirina deqên Şanoyên pêşkevtinxwaz û serkevtî, hertim Şano kirine terîbûnek giştî ya xelkê û li ser wê terîbûnê dirûşm, hest û xwast û hewcehiyên netewan anîne holê û herwiha hegerek bûye bo hişyarkirina civatên xelkê û berevanîkirin ji mafê berheq yên civakê bi aliyên mê û nêr ve.
Renge hin kes bipirsin: çima pirsa jinan di civakê de hertim bi cuda tê ber bas û bi awayekî taybetî qala vê pirsê tê kirin?
Di bersîva vê pirsê de divêt were gotin: Heya ku rêvebirina kar û barên aborî, civakî, çandî û siyasî wekhev bikeve ber destê jin û mêran, heya ku çewisandin û tepeserkirina jinan bihê ji nav birin, heya ku jin mil bi milê mêran bi awayekî



wekhev pişikdariyê di kar û çalakiyên rewşenbîrî û çandî de bikin, heya ku ew bîr û hizrên pûç û kevneşop yên ku jinan lawaz û bêşiyan dihesibînin, bavêjne zibildana dîrokê û heya ku terzên paremayî yên bi mêrdana keçan ji nav biçe û ....
Hewceye ku hemû mirovên hişyar û pêşkevtinxwaz bi dijî çewisandin û tepeseriya jinan rawestin û bo berevanî kirin ji mafê berheq yên jinan dengê xwe bilind bikin û bo cihgirkirina wekheviya navbera jin û mêran di warên cur bi cur yên jiyanê de bixebitin.
Bêşik ev erke jî di astê navnetewî de weke erkekî mirovî tê hesibandin û bi çavê rêz û hurmet ve tê mêze kirin.

# NAMEYEK Jİ DENGBÊJÊ KUL Û XEMAN RE

**Letîf Epozdemir**

Dema ku min bihîst, ew nexweşiya kambax û bêkeys vê carê jî dev avêtiye pêsîrê te, bi rastî ez gelek xemgîn bûm. Lewra ku êdî em gelek bi başî dizanin, xerîbî malxirabî ye, xerîbî malwêranî ye. Her çend te û bi dehan ronakbîrên wekî te, li welatê xerîb û xurbetê, gelek berhemên bijare amade kiribin jî, xûya kir ku xerîbî, ji tenduristiya we, ji laş û bedena we, gelek tiştan dibe û carek din bi paşve neanî.

Xerîbî, bi me re, bêbextî kir. Bû sebeb ku hûn berhemên bijare biafirînin, lê wekî bedel jî, ji wê, jiyê we, jiyana we, canê we xwast...Bextreşî û bê siûdî ev e, ez bêjim..

*Keser, rûniştiye li ser tevnê,*
*Şeh dike hiryê, dihonê*
*Bi emegê destan û nûra çavan,*
*Kulavê reş tê meydanê,*
*Jiyan bi hemû bar û piştiya*
*Şîrîne dîsa, lê*
*Emrê çûyî, venagere, paşda nayê*
*Serborî, li ber çavan*
*Diçin û tên, ku*
*Hîn ji wan şêrîn bûn û hin jî tal,*
*Dil dikeve xeman*
*Ziman dibe lal,*
*Heyfa min tê li rojên borî*
*Kul bi ser min vedigrin,*
*dibin zal,*
*ku ez nexweşim êdî*
*nemaye îro tu mecal,*
*ez li aliyek, li yê din serborî*
*mame di mabeynê,*
*rojên xweşbor, min dikin dilşa*
*yên dijwar, min dixin êza,*
*bextê bireş, sêwî ye*
*pişta xwe daye dîwêr*
*li beroj rûniştiye,*
*di pê derbaziya roja,*
*feleka xaîn, ji dûr ve*
*ji min re bi çav dike*
*dibêje, bes e êdî, were*
*Emrê te temam bû, qediya…’’*

Bêguman, tiştên ku bi serê we hatin, we bi dilê xwe hilbijart; kesek tu tişt bi zorê bi we neda kirin û nikarin bidin kirin jî. We nexwast ku hûn yek demek jî, vî gelê bextreş û belengaz, bêdeng bihêlin yan jî, pişta xwe biguhêzin daw û doza milet. Bê guman, we jî -mîna gelekan-, dikarî bûn dakevîn derya kêf û seyranê. Wê gavê êş û jan, ewqas bi hêsanî, nedikaribûn bi pêsîra we ve, bigrin.

We, rêya xwe bijart û we mil da milê gelê Kurd. Ya rast û ya ku li we jî dixuya, ew bû. Camêrî û mêrxasî ew e ku mirov di rojên teng de miletê xwe bi tenê nehêle. Lê mala zordariyê xira bibe, ne hişt ku rojeke şahî û dilşahî para me bikeve. Hemû rojan derd û êş û jan, hemû rojan kul û xem û keser... Mîrata xerîbiyê jî, da ser wan derd û keseran û bû derdê ser derda. Kela zilmê were xwarê, ne hişt ku em tu tam û lizetek bibînin ji jiyanê..

Sirgûniyê, gelek tişta da me, lê heyf û mixabin ku ji wan zêdetir jî, ji me sitend. Mîrata hesretê, dilê me yê polayîn, roj bi roj heland. Ew dilê ku di dehan îşkence û lêdan û tedayiyan de binketî nebû û hêviya xwe neşikand, anî hetanî van rojan.

Îro di vê dema xweş de ku va ye êdî beşek ji welatê me yê şirîn azad e,na.. na.. ne bi qîma me ye, em qaîl nabin, na.. Lewra ye ez dibêjim, biborin, em nahêlin ku hûn terka me bidin, lewra hê gelek karê me maye. Tikaye êdî ji îro pê ve, neçin welatê xerîbistanê û me di hesret û mereqê de nehêlin. Kurdistan li benda we ye, çavê wê li rêya we ye.

Hevalê bi qedr û rûmet, Kekê delal,

Ez bawerim ku ew bedena zexim û ew canê qayîm, wê li hember vê nexweşiya kanbax jî, bi mêrxasî li ber xwe bidin û li dawiyê serkevtî bibin. Hêvîdarim ku di demek kin de, mizgîniya başî û saxiya te wê bigêje me teva.

Her sax û baş be bira. Bizane ku yên ji te hez dikin gelek in û yê ku bi te re neyartiyê dikin, derd û kul û keser in, ew nexweşaniya bêbext e.

Vêca te divê ku tu kî dilşa bikî? Yan me û yan jî wan…?

Roj li me dereng e, zû rabe bira. Romana xwe ya nivîşkan temam bike, xwendevan li benda te ne.

Zû were bira zû were, rewşenbîr li vira civiyane, hêviya te ne. Hetanî tu neyê, ev civîn dest pê nake. Gaziya hejar û nedara ji bîr neke.

Dengbêjên te, li ber derî, civiyane, di tûrê her yekî de, deh çîrok û kilam û lawje.. Dikin hewar û gazî, dibêjin ‘’ lo bira tu çima nanivîsînî van bûyeran, çima me ji, bar u piştiyê me xelas nakî.. ? ‘’


Em bi te re ne, piştevanê te ne. Em bi te bawer in ku tu rojek zûtir werî nav dost û hevala bigerî. Dîsa werî civata me…

Dereng nemîne, tikaye...Bi ceribîne, hêsan e….

www.arsivakurd.org

# RONAKBÎRÎ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Rewş, ew şert û mercane ne ku mirov tê de dijî û xwe li gorî wê amade dike. Rewşenbîr jî ew kesê/a ku hay ji rewşa civakê heye û bi hestyarî ve nêzîkî pirsgirêkên wê dibe.

Ji destpêka domana ronakbîriyê were û heta îro, der barê rol û rista kesên rewşenbîr û peywira wan de gelek tişt hatine gotin, vegotin û nivîsandin. Belê divê kesên rewşenbîr û ronakbîr di heman katyegoriyê de neyên dîtin û nirxandin. Lewre her du têgih ne heman tişt in û qet nayên heman wateyê. Rewşenbîr, ew kesê/a ku rewşa civakê dizane û haya wan ji pirsgirêk û arîşeyên civakê heye. Belê kesê/a ronakbîr, ligel ku rewşa civakê dizane, her wiha ji bo çareserî û ronîdariya civakê jî hewl dide û têdikoşe. Ronakbîr, ew kesê/a ye ku dibêje û dike. Ew kesê/a ye ku gotin û kirinên wan li hev derdikevin. Ew kesê/a ku çavên xwe ji tiştekî re nagire û ew kesê/a ye ku ji tu tiştî napelikîne.

Îro gelek xwandewar, nivîskar, siyasetvan ku xwe wekî ronakbîr didin nansîn û binavkirin, belê qet bi vî navî re ne li hev in, hene. Bi rastî dibe ku ew wekî nivîskar, rewşenbîr û siaysetvan bêne dîtin; lê qet ne pêkan e ku ew wekî ronakbîr werin qebûlkirin. Lewre ew ji berjewendiyên civakê bêtir di berjewendiyên xwe de difikirin. Ji zanîn û zanyariyê bêtir, bi tiştên derezanistî eleqedar dibin. Ji bûyerên gerdûnî bêtir, tenê qewam û meseleyên herêmî û xwecihî dibînin. Ji pirsgirêkên mirovahiyê bêtir bi pirsgirêkên mirovan re serê xwe diêşînin. Li şûna fikr û fersetên bingehîn, nêrîn û nêzîkahîtêdanên kesan nîqaş dikin. Ji bo wê dibe ku ev yek taybetiya kesên rewşenbîr be; belê qet ne ya kesên ronakbîr e. Çima? Ji ber ku ronakbîrî tiştekî din e.

Kesê ronakbîr, beriya her tiştî fikr û hizra xwe seranser ji ferset û felsefeyek zanistî werdigire û li gorî pîvan û rêbazên zanîn û ronîdariyê tevdigere. Ew bi xwe, tu car di bin bandor û hîkariya nêrînên siyasî û berjwendperest de namîne. Jêder û çavkaniya zanîn û agahiyên xwe, her gav dispêre azîne û rêbazên zanistî. Him rewşa civakê dibîne û him jî ji derd û xemên civakê re li çareseriyê digere. Tu qedexe û astengiyan napejirîne. Li hember zagon û qanûnên fermî yên ku jiyana gel û civakê ditengijîne, radiweste û têdikoşe. Pêşî bi zimanê civaka xwe diaxive, bi zimanê wê difikire û bi zimanê wê dinivîse. Ji bo ku mafê civakê bi dest bixe li gel civakê cih digire û pê re dimeşe. Ji ber bindestî, xizanî û bintûteyiya civakê şerm û fedî nake. Bi hemû kirin û kardariya xwe, belê bi fikr û hizra xwe li hemberî serdestiyê şer dike. Ji darizandin, girtin û tawanbarkirina hêz û kesên desthilatdar qet natirse.

Mixabin îro hejmara kesên ronakbîr bi qasî tiliyên destan kêm û hindik in. Ligel ku gelek rewşenbîr xwe wekî ronakbîr didin nasîn jî, bi rastî tu eleqeya wan bi ronakbîriyê nîne. Ew ancax dikarin bibin rewşenbîr. Çimkî ew tim gorî siyaset û berjewendiyên rojane tevdigerin. Tenê navê wan ronakbîr e. Tu car bi zimanê gel napeyivin. Têkilî pisgirêkên civakê nabin. Haya wan ji formulasyonên zanistî nîne. Li şûna ku ew pirsgirêkan çareser bikin, ew bi xwe dibin pirsgirêk...

Em bi hêsanî dikarin îro behsa hebûna kesên rewşenbîr bikin; belê mixabin em nikarin behsa hebûna kesên ronakbîr bikin.. Îcar heta ku civakek ronakbîrên xwe û ronakbîrek jî civaka xwe ji nû ve neafirîne, ne pêkan e ku aştî, azadî û aramiya civakê pêk were. Bi qasî tîyekî/e ser avê îro pêdivî bi ronakbîrên nû û nûjen heye. Gava ku em li dîroka mirovahiyê dinihêrin, em dibînin ku pêşketina her civakê û ronîdariya mirovahiyê tu carî bi saya siyaset û rewşenbîrên demê pêk nehatiye. Her gav bi saya ronakbîrên wê pêk hatiye. Hemû şoreşên hişmendiyê û ronîdariyên civakî bi saya ronakbîr û zanyarên demê pêk hatine. Ji bo wê, hewce ye ku rewşenbîrî û ronakbîrî bi hemû awayî ji hev û din were veqetandin. Û em zêde pişta xwe bi rewşenbîrên îroyîn girê nedin. Jixwe rewşenbîr, di her dem û domanê de wekî berdevkê siyaset û serweriyê tevgeriyane û tevdigerin. Belê rewşenbîr her gav muxalîf û dijberên desthilatdariyê bûne û di hemû merc û şertên dijwar de fikr û feraseta xwe bêdeman parastine û bi vê mebestê tevgeriyane.

Dibe ku kesên rewşenbîr, hay ji rewşê hebin û bi desthilatdariyê re li hev bin-pirên wan li hev in jî- Dibe ku fikr û hizra xwe biguherin û rojê li cihekî cih bigirin. Dibe ku berjewendiyên xwe di ser berjewendiyên civakê re bigirin. Dibe ku ji rastî û duristiyê deman bidin û rewşa xwe rojane biparêzin...Belê di feraset û tevgera kesên ronakbîr de cihê van xisûsiyet û taybetiyan qet nîne. Belê ronakbîr, him hay ji rewşê heye û him jî rerwşê diguherîne. Ronakbîr, bi zanîn û zanyariya xwe re li hev e. Ji bilî wê, ne tu tişt ji bo wî/wê meqbûl û muteber e û ne jî çûnbar û derbasdar e.

Kaniya Helbestan

## EŞQ Û SEWDA

Letîf Epozdemir

sedan Sal e di rê de çûn
Hêj ne geyiştin menzilê
mirazê hezaran di çavan bû.
sedem serbestiya av û hewayê
reben rabûn dane desta tevr û bêr
Ref ref bi rêz
Ketin rêya jiyanê
ji şikeftan hatne der
Berê wan li mizgeft û dêr
Pêsîra wan maye heval
Digel derd belayê
Lehengan xwe avêtin serê
çiyayên asê
Roh li ser pozê wan
Kefenê wan li piştê
Ji bo zehfan
Ger heye û Veger tune ye
Ji bo rojên bextewer.
Yên ku sax in.
Bê miraz man
Digeviz in di nav cewr û cefayê
Kî naxwaze dilê şahî li Dinyayê
Qet nebîne perîşanî di jiyanê
Nekşîne emrê bê wefa. Paşe rojê.
Bi rûgeşî her tim bibîne kêf û
seyranê
Dabor nebin tu car ji cobarên
dijwar
Bi piştek xwar
Li ser seran qemçî û dar
Bê şik heqê me jî heye ku bi ken
bin
Ne rûgirîn
Wê bi bîne Dinya Alem
Wê gavê eşq û sewdayê
Ji Şîmal, rojhilat û rojava
Hûn bi xêr bên
Ser sera û ser çava
Çar û nedar temam li benda we
ne
Werin bi mizgîna bext û wefayê.
Ey şair dîsa serê te mij û moran e
Hiş û sewda çûye der.
Fila fila dilan e.
Îro ne roja şer û qirên şîn û
giryane.
Baş binêre tu li serab û vê bayê....


www.arsivakurd.org

# Xaçepirs

Amadekar: Şehab Xalidî

**Çeprast:**
1. Berevajî tê wateya **Bîstekê** – Di Farsî de tê wateya **Xwediyê**.
2. Hekî **T** bihê zêdekirin, navê pirtûkeke pîroz e – Navekî Erebî yê mêra ye.
3. Ew giyayê zêde ku di nava bistanan de heye – Ew gundê ku Simkoyê Şikak li wir ji dayîk bû.
4. Tê çandin û di nava şorbayê de jî bi kar tê – Bilêvkirina tîpa **T** di Kurmancî de – Ew jî Kurd in.
5. Di Îngilîzî de tê wateya **Hilkirin** - Girûpeke şorişî ye ku bi dijî dewleta Taylandayê şer dike – Berevajî di Erebî de tê wateya **li der barê**.
6. Mûşekek ku Îran çê dike.
7. Avê hênik radigire – Zêhn.
8. Heke ev tîpa bê ducarîkirin, tê wateya Memik bi zimanê zarokên sava.
9. Hevjîna parêzerê perwendeya şehîd Dr. Qasimlo – Nav bi Turkî – Ew herêma ku daxwaza serxwebûnê ji Endonîzyayê dike.
10. Serkomarê pêşîn yê Lîbiryayê ku heyamekê berî niha radestî dadgeha Lahe hate dan.

**Serjêr:**
1. Ji nêyşekerê tê çêkirin û di ciyê benzînê de mifah jê tê wergirtin – Yabî.
2. Nexweşiyek e.
3. Navê bajarekî Îranê ye – Hekî **Î** bihê zêdekirin, navê bajarekî Pakîstanê ye.
4. Nemir – Wacib.
5. Di Soranî de tê wateya cilîda Hespan – Zindewerek e.
6. Mîrat di Farsî de – Wekhavî di Erebî de.
7. Berevajî, heke ev peyv bihê ducarî kirin, dengeke ku li sirûdan de pitir bi kar tê.
8. Berevajî cure demançeyek e –Rê û Şop.
9. Duyemîn kesê dewlemend ê cîhanê.
10. Berevajî navê kesek azadîxwaz û di eslê xwe de Mesîhî bû ku çend salan berî niha di Başûra Kurdistanê de hate terorkirin – Ev êmîş li Urmiyê de zaf e.



## Bersiva Xaçepirsa Hejmara 42’an

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| K | ■ | ■ | A | H | A | D | ■ | ■ | E |
| U | H | A | T | ■ | ■ | A | M | A | L |
| L | O | M | A | ■ | ■ | L | Î | B | Î |
| A | D | Î | L | E | X | A | N | I | M |
| ■ | A | N | A | ■ | ■ | H | O | D | ■ |
| ■ | ■ | ■ | N | ■ | ■ | U | ■ | ■ | ■ |
| K | Ê | W | ■ | B | Î | ■ | H | Î | S |
| U | Z | A | L | ■ | ■ | B | U | T | U |
| W | A | N | Î | ■ | ■ | U | R | U | Ç |
| Î | ■ | ■ | M | A | R | Ş | ■ | ■ | Î |

Peyva veşartî: Ç I N A R (1 2 3 4 5)

## Xaçepirsa Hejmaran (Sudoku)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | | 5 | | | 7 | 1 | 9 | 3 |
| | 1 | 3 | 5 | | 6 | | | 4 |
| 2 | 7 | | 1 | | | | 6 | |
| | 6 | 2 | 8 | | 5 | 4 | | |
| | | | | | | 7 | | 6 |
| 3 | 4 | | 9 | | 2 | 5 | | 8 |
| 4 | | | 7 | 5 | 9 | 3 | | 1 |
| 7 | | 1 | | | | | 5 | 2 |
| 8 | 5 | | | 3 | 1 | 6 | 4 | |

**Ji bo bersîvdana Xaçepirsa hejmaran (Sudoku)yê ya nû, tenê van sê xalên jêrîn berçav bigirin:**

1. Hejmarên 1-9’ê di xet(xêz) û stûna serjêr de tenê carekê dubare dibe.
2. Hejmarên 1-9’ê di xet(xêz) û stûna çeprast de tenê carekê dubare dibe.
3. Hejmarên 1-9’ê di nava çargoşeke 3×3 de tenê carekê dubare dibe.

## Bersiva Sudoku a Hejmara 43’an

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 3 | 9 | 6 | 1 | 4 | 2 | 7 | 8 |
| 2 | 6 | 1 | 7 | 9 | 8 | 5 | 4 | 3 |
| 7 | 8 | 4 | 3 | 5 | 2 | 9 | 1 | 6 |
| 6 | 1 | 5 | 4 | 7 | 9 | 3 | 8 | 2 |
| 8 | 2 | 3 | 5 | 6 | 1 | 7 | 9 | 4 |
| 4 | 9 | 7 | 8 | 2 | 3 | 6 | 5 | 1 |
| 1 | 7 | 8 | 2 | 3 | 5 | 4 | 6 | 9 |
| 9 | 5 | 2 | 1 | 4 | 6 | 8 | 3 | 7 |
| 3 | 4 | 6 | 9 | 8 | 7 | 1 | 2 | 5 |

www.arsivakurdi.org

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne
Agirî li ser înternetê:
http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php

Navnîşana derveyî welat: PDKI . C/O : A.F.K. 17, Avenue d'Italie
75013 PARIS – France
E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com



# Di Bûyereke Tal De Pêşmergeyekî PDK Îranê Canê Xwe Ji Dest Da




Êvariya roja înê 30.04.1385(21.07.2006)'an, tevî avabûna rojê, êvar bi ser temenê pêşmergeyeke PDK Îranê jî hat. Heval **Rehmet Seyfî** kurê Hebîbula , xelkê gundê Qamlo ser bi bajarê Qurwe li dema xweavêdanê de cane xwe ji dest da û çû nava refê karwanê şehîdên PDK Îranê.

Nemir Rehmet Seyfî, di bervara 29.01.1383(2004)'an de rêya xebatê hilbijart û hate nava refên şoreşgerên PDK Îranê. Piştî bidawîanîna zandora destpêkîn a pêşmergatiyê, çeka şerefê hilgirt û bi fermî bû pêşmerge. Heval Rehmet pêşmergeyeke bi emeg, bi dîseplîn, hêja û zana bû, her wek ku di jiyannameya xwe de dibêje: "seba newekhevî û bêedaletiya rejîmê min biryar da ku dijî çewisandin û newekheviyê xebatê bikim". Şehîd Rehmet bo parastina nexweşxaneya PDK Îranê hate destnîşan kirin û piştre ji ber jîhatîbûn û leyaqeta wî di birêvebirina erkên pêşmergatiyê de wekê cîgirê pela nexweşxanê û piştre weke fermandeyê pela pêşmerge ya parastina nexweşxanê hate hilbijartin. Navhatî weke pêşmergeyeke rûgeş, xebatkar û emegnas ji aliyê berpirsên nexweşxanê ve çend caran hatiye teşwîq kirin û ciheke taybet di nava dilê hevrêyên xwe de peyda kir.. Şehîdbûna Rehmet bû sedema kul û kesereke giran li ser dilê hevrêyên wî û ji destdayîna pêşmergeyeke bi vêc bo PDK Îranê.

Komîsyona Civakî û Navenda yek a Kurdistanê serxweşiyê ji malbata û kes û karên wî dike û xwe di xem û taliya wan de bi şirîk dizanin.

Hêjayî gotinê ye ku bi wê hincetê li yek ji binkeyên Deftera Siyasî ya PDK Îranê de bi beşdarbûna endamên Deftera Siyasî, Kadro, pêşmerge û malbatên wan, rê û resmek ji bo bibîranîna Şehîd Rehmet hate lidarxistin.

# Bêstûn dikeve nava lîsteya cihwarên berbiçav yên



Bêstûn li 30 kîlometriya Rojhilatê bajarê Kirmaşanê hilketiye

Rêxistina Yonesko, saziya perwerdehî, zanistî û çandî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, cihwarên dîrokî yên Bêstûn li nêzîk bajarê Kirmaşanê ji bo xistine nav lîsteya cihwarên berbiçav yên mîratên cîhanî ji berçav girtiye.

Rêxistina Yoneskoyê ev mijare di bere berê sêyemîn civîna **Komîteya Mîrata Cîhanî** ku di 8- 16.07.2006'an, di Wîlniyos, paytexta Lîtvaniyê de tê lidarxistin, ragehand.

# Dê Di Demeke Zû De Parlemana Ewropayê Deng Bide Pirojeyekê Derheq Rewşa Ronakbîriya Kurdî Li Turkiyê

Li gor ragihandina kanala "NTV" ya Turkiyê, Rosl Constin, wezîrê pêşin yê hikûmeta Îskatlendê, raporek li ser awayê pirojeya biryarekê di bin navê "Rewşa ronakbîrî ya Kurd" pêşkêşî Parlemana Ewropayê kiriye ku çend xalên berçav ên jêr de hatî, tê de hene:

1. Hecwe ye ku Turkiye mercên welatên Ewropayî îmza bike û bipejirîne ku ji niha pêve divêt zimanên herêmî û kêmaniyên di wî welatî de biparêze.
2. Di serhijmariya xwe ya pêşerojê de divêt ku Turkiye hijmareke rast û dirust ji hejmara Kurdên Turkiyê pêşkêş bike.
3. Di nava zanîngehên Turkiyê de rê ji bo fêrbûna zimanê Kurdî bihê dayîn.
4. ji bo xwendin û elimandina zimanê Kurdî derheq karîn û asankariyan ji hemû malbatên Kurd re zaniyariyên kemilî bihê dan.
5. ji bo merema nasandina ronakbîriya Kurdî navend û rêxistin di Turkiyê de pêk bihên.



6. Dana derfeta yasayî û piştevanîkirin ji çend komeleyên ronakbîrî yên Kurd.

Hejmara Kurdan di wan herêmên jêr de 25-30 milyonan di rapora han de hatiye texmîn kirin û bi yekemîn netewe di cîhanê de ku li gor nifûs, xwedî welatê xwe ninin, hatine hesibandin. Kurd bi wî awayî hatine par par kirin:

Li Turkiyê 12-15 milyon, li Îranê 8 milyon, li Îraqê 5 milyon, li Sûriyê 1-2 milyon, li Ewropaya Rojava 1.2 milyon, li Efxanistanê 200 hezar kes, li Azerbaycanê 150 hezar kes, li Libnanê 80 hezar kes, li Ermenîstanê 45 hezar kes, li Gorcistanê 60 hezar kes, li Turkemenîstanê 40 hezar kes, li Amerîkayê 20 hezar kes û li Kanadayê 16 hezar kes.

Rapora han di demekê de hatiye weşandin ku dewleta Turkiyê bi awayeke nedirust êrîşê dike ser "PKK"ê û ev riftara Turkiyê hizra cudabûnê di nava Kurdan de bihêztir dike.

Di sala 2004'an de cureyeke guhertinê li Turkiyê de hatiye holê. Lê ne bi awayê hewce ye û divêt ku rêxistinên Ewropayî û welatiyên Turk yên ku bawerî bi parastina gelê Kurd û ronakbîriya Kurdî hene, zextê bixin ser hikûmeta Turkiyê ji bo ku guhertinên zêdetir pêk bîne.

Her wiha biryar e ku li destpêka meha Tişrîna Yekem a sala 2006'an di Parlemana Ewropa û li bajarê Strasborgê de deng bi pirojeya han re bihê dan.

**Çavkanî: "Pukmedia.com"**

www.arsivakurd.org